FILMÊ ŞERÊ PEROKAN

Yasîn Dêreşî

Li ahenga dayîkbûna welatî

li senterê bajêrî
filmê şerê perokan
dihête nîmayişkirin.
Her êkê perokek
sirûdek,
wêneyek
perokê nîştimanî
di nav de
hewar dikir.
Rondikên pêşemaniyê dib-
arandin
sirûda nîştimanî
dihate sêdaredan.
Kes bo nedigirî
çi pirse bo nebûn.
Gorên şehîdan
bi bangê êkbûnê
hewar dikir
senterê bajêrî
ew çi film,
çi şerê perokan e?...
Ne armanca xwe pina me pe
Pêkve bibêjin, Ey Reqîp.
Pêkve bilind bikin
perokê arasbirî
da xewna me
bikin rastî.

Hilo! rabe cadeya bajêrê
heta kengê
li bin perdeya bêdengiyê de
çavên xwe girî
were da di gehekê de ne
rêbaza şehîdan
bike yasa û
van perokan
serad û bêjing bike.
Yên gunehbar
bila bihêne sêdaredan
xwîn bihayê xwînê dizane.
Yê kêlyê Şeda
bi tiveng azad kirî
ax bi xwînê sor kirî
li dadgeha te de
tinê maf hebin.